



# Anesteziya giştî ya zarokê we

Vê belavokê rave dike ku divê hûn li benda çî bin dema zarokê we were nexweşxaneyê ku bi anesteziyek gelemperî emeliyet bibe. Ev ji hêla anesteziştan ve, li gel nûnerên nexweşan û dê û bavên hatiye nivîsandin.

## Anestezi û anestezişt

**Anesteziyek gelemperî** piştrast dike ku zarokê we di dema emeliyeteke an prosedurekê de ne li ser hişê xwe ye û êş nakê.

**Anestezişt** bijîşkên pispor in ku anesteziyê didin û di dema emeliyatê û başbûnê de li tendirustiya zarokê we dinêrin. Herwiha ew piştî emeliyatê ji nêz ve bi dermankirina êşa zarokê we re eleqedar dibin.

**Anestezi** derman in ku ji bo destpêkirinê û domandina anesteziyê tên bikaranîn.

- Hin anestezi bi rêya bikaranîna lûleyek plastîk a bi navê kanûla, bi derzîkirina ji demarê dest pê dikin lê dibe ku bi hilmek gazê were domandin.
- Anesteziyên din bi bêhnkirina gazê dest pê dikin û pişt re, dema ku zarokê we di xew de ye dê kanûla were bikaranîn.

Anestezişt an hemşîreyê pêş-nirxandinê bi gelemperî dê li ser tecrubeyên berê yê zarokê we yê bi anestezi an derziyan re dê pirsan bike. Herwiha ew ê bi gelemperî rêbazên dayîna anesteziyê bi we re nîqaş bikin û bipirsin ka tercîhek we û zarokê we heye an na. Bi gelemperî sedemên bijîşkî hene ji bo tişt bi rêbazên taybet werin kirin û ew ê bi we re biaxivin ku ew kîjan awayê tercîh dikin ji bo destpêkirina anesteziyê, û çima (sedemên wê). Daxwazên we û yê zarokê we girîng in.

Piştî nîqaşkirina bi anestezişt re, yek ji planên ku bi we re hatiye nîqaşkirin dê bi awayekî normal were şopandin. Carna dibe ku biryara hatiye dayîn biguhere, li gorî bertekê û bersiva zarokê we di dema krîfîk de.

Roja emeliyatê an roja beriya wê heke hebe hûn ê karibin pirsên xwe bînin ziman. Herwiha, hûn dikarin Hevkarên Anesteziyê jî bibînin ku ew jî pisporên tendirustiyê yên gelek biperwerde ne. Hûn dikarin li ser rola wan û fîma anesteziyê bêtir agahî jî malpera me bigrin: [www.rcoa.ac.uk/patientinfo/anaesthesia-team](http://www.rcoa.ac.uk/patientinfo/anaesthesia-team)

## Amadekirina zarokê we

Çend tişt hene ku hûn dikarin bikin ji bo zarokê xwe ji hatina nexweşxaneyê re amade bikin.

Heke zarokê we pir piçûk nebe, divê hûn hewl bidin û rave bikin:

- ku ew diçin nexweşxaneyê
- ku ew ê bikevin emeliyatekê an testekê
- hin agahdariyên bingehîn di derbarê çî dê bê serê wan dema ew li nexweşxaneyê bin.

Dema çêtirîn ji bo dayîna van agahdariyan li gor zarokan diguhere. Zarokên pêşdibistanê muhtemelen rojek berê bizanibin bes e. Dibe ku ji bo zarokên mezintir bêtir dem lazim be.

Herwiha, li ser malpera Kolejê ji bo zarokên ji temenên cuda belavok hene ku dikare ji rûpelên *Agahdariya ji bo zarok, dê û bav û berpirsiyaran* were daxistin [www.rcoa.ac.uk/childrensinfo](http://www.rcoa.ac.uk/childrensinfo)

- *Rees Bear dikeve anestefîkê* (3-6 salî, li gel xwînerek mezin).
- *Davy detektîf: derbarê anesteziyê de agahî* (7-11 salî)
- *Anesteziya giştî: ji bo ciwanan rêbernameyek kurt* (12 salî û mezintir)

*Operasyona min a Daycase: Xwendinek Hêsan* û çavkaniyên berdest herwiha li vir jî hene: [www.rcoa.ac.uk/patientinfo/easyread](http://www.rcoa.ac.uk/patientinfo/easyread)

Herwiha, anîmasyonêk bi navê *Xewekî Kûr a Kurt- Rêbernameyek Malbatî ya Anesteziyê* jî heye ku ji bo zarokên heta 12 salî re alîkar dibe: ([www.vimeo.com/138062201](http://www.vimeo.com/138062201)).

Hin nexweşxane rojek beriya emeliyatê şansê dîtina beşa emeliyata zarokan li we û zarokê we teklîf dikin. Ev awayek baş e ku ji amadekirina zarokê we alîkar be û nîgeraniyê kêmbike. Li gelek nexweşxaneyan fîmek lîstik-terapiyê heye ku dikare bi lîstikê ravekirinan bike û nîqaşê teşwîq bike.

## Hin pêşniyar ji bo hûn dikarin ji zarokê xwe re çî bibêjin

- Rave bikin ku emeliyet an test dê li gorî şert û mercên wan, dê alîkariya zarokê we bike ku baştir an jî qismen baştir bibe.
- Zarokê xwe teşwîq bikin ku li ser operasyonê biaxive û pirsan bike. Pirtûk, lîstik û çîrok dikarin bibin alîkar. Çavkaniyên wekî pelên boyaxkirinê li ser malpera Kolejê hene: [www.rcoa.ac.uk/childrensinfo](http://www.rcoa.ac.uk/childrensinfo)
- Ji zarokê xwe re wextê bêjin. Dê kengê bikevin emeliyet an testê? Dê mayîna wan li nexweşxaneyê çiqas dirêj be (eger hûn vê dizanin)?

Ger zarokê we bi şev li nexweşxaneyê bimîne, bila ew bizanibin ku hûn ê jî karibin bimînin an na. Heke hûn ne bawer bin ku ev mimkun e an na, hûn dikarin ji nexweşxaneyê re telefon bikin bo piştrastkirinê.

Hemşîreya we dikare rê nîşan bide li ser tiştê ku divê hûn bibin nexweşxaneyê lê ji kerema xwe dermanên hergavî ên ku zarokê we di pakêta orjînal de, pîjema, firçeyek diranan, firçeya por, guhertina kincên binî an potikan û pêlîstokek ku zarokê we jê hez dike bînin. Zarok bi piranî kêfxweş dibin ku biryar bidin bo pakêtkirinê lê çêtir e ku hûn gelek pêlîstokan nexinê.

Telefonên mobîl û tablet dikarin pir bikêrhatî bin lê ji bîr nekin ku şarj û berguhkên xwe bînin.

Lazim e ku hûn dermanên êşkuj yê wekî paracetamol û ibuprofen amade bikin dema zarokê we vegere malê. Nexweşxaneyê we dê li ser awayê girtina wan li we şîretan bike.

### **Ne baş e hema beriya emeliyatê?**

Heke di nav du hefteyên emeliyatê de kuxikek an sermayek girîng li zarokê we peyde bû, an jî di nav çend rojan de zikêş an vereşîn peyde bû divê hûn ji nexweşxaneyê re telefon bikin. Dibe ku lazim be emeliyatê taloq bikin heta ku zarokê we baştir be.

Ji ber kuxik û sermayê dibe ku zarok, nemaze yê piçûktir, di bin anesteziyê de zehmetiya nefesê bikşînin. Ew dikarin zarokan jî bixin bin xetereta mezin a enfeksiyona singê. Ji ber vê yekê girîng e ku hûn karmendên nexweşxaneyê agahdar bikin ku zarokê we nexweş bûye.

Ji kerema xwe herwiha karmendên nexweşxaneyê agahdar bikin ka zarokê we di van demên dawî de bi xurîk, sorik an enfeksiyonên din ketiye an na.

Aşî destekariyeke bijîşkî ya gelek girîng e û em hemû dê û bavan teşwîq dikin ku rêberên aşiyê yê NHSê li ser malpera NHSê bişopînin:

[www.nhs.uk/conditions/vaccinations](http://www.nhs.uk/conditions/vaccinations)

Bi asayî, aşiya dawî derkefî ji bo zarokên ku anestezi derbas kirine ne pirsgirêk e heke beriya emeliyatê neketibin tayê ku di vê rewşê de hin caran çêtir e emeliyat were taloqkirin. Ev rewşekî gelek neasayî ye, lewma em li dê û bavan pêşniyar dikin ku ew aşiyên plankirî bidomînin û wan ji ber emeliyata plankirî betal nekin.

### **Nirxandina klînîk ya pêşemeliyatê/kontrola telefonê**

Dibe ku hemşîreyek ji nexweşxaneyê beriya emeliyatê bi telefonê li we bigere da ku hin hûrgiliyên di derbarê tendirustî û dermankirina zarokê we de fêr bibe.

Herwiha, ev destûr dide wan ku heke pêwîst be beriya emeliyatê test û amûrên din dirust bikin.

Gelek nexweşxane dê zarokan, bi taybefî yên xwedî nexweşiyên demdirêj in an jî dikevin emeliyetên girîng, vexwîne ku beşdarê nixandina klînîkê ya pêşemeliyatê bibin. Li vir ew dê pirsên di derbarê tendirustî, dermankirin û alerjiyên zarokê we de ji we bikin. Ew dê çeltek ji çermê hildin (çerm bi riya çovikek pembû û bi awayek nazîkane tê firikandin) da ku ew beriya emeliyetê bikaribin ji bo enfeksiyonan kontrol bikin û testên xwînê bikin ku belkî pêwîst be. Dibe ku ew cihê ku zarokê we dê biçe nîşanê we û zarokê we bidin û we di derbarê emeliyata zarokê we de agahdar bikin. Dibe ku hûn anesteziyê bibînin ku karibe qala bijareyên anesteziyê û xetereyên taybet ji we re bike.

## Di roja emeliyata zarokê we de

Divê nexweşxane di derbarê wexta sekinandina xwarin û vexwarina zarokê we de agahiyên zelal bide we. Şopandina van agahiyan ji bo we û zarokê we gelek girîng e. Gava anesteziyê heke di mîdeya zarokê we de xwarin an jî tiştê avîn mabe, dibe ku ew were qirika wî û ji wir jî here pişika wî.

Heke ew ji dema pêwîst dirêjtir bêyî xwarin û vexwarin neseकिनin zarok aramtir hîs dikin.

Yên jêrîn, bi gelemperî demên lihevkiî ne ji bo ka beriya emeliyatên ne-acîl kengê hûn dikarin xwarin û vexwarin bidin zarokên xwe; lê ji kerema xwe agahiyên ku nexweşxaneyê dane we bişopînin çimkî dibe ku ew ne heman bin.

- Zarok dikarin şeş saet beriya emeliyatê xwarinek sivik û/an jî qedehê şîr bixwin û vexwin. Piştî wê, divê ew teqez şîrî jî di nav de tiştê nexwin û benîşt necûn.
- Pitikên li ber şîr heta çar saet beriya emeliyatê jî dikarin şîrê dayîkên xwe bimijin.
- Pitikên ber bîberonê heta şeş saet beriya emeliyatê dikarin mamayên xwe bixwin (ji kerema xwe ji bo pitikên gelek piçûk an jî pitikên zûzayî li agahiyên cuda yên nexweşxaneyê xwe binêrin).
- Heta saetek beriya emeliyata wan, divê zarok vexwarina avê an jî vexwarinên zelal bidomînin. Ev afîkariya wan dike ku avdar û aram bimînin.

Hin beş destûr didin zarokê an jî wî teşwîq dikin ku wexta bigihêje wir tiştê vexwe.

Heke zarokê we di demê nêz de xwarin xwaribe, emeliyat dê derengî bê kirin an jî bê taloqkirin bo rojêke din.

Roja emeliyatê, divê zarokê we dermanên ku hatine gotin bigre.

Gava hûn ghiştin nexweşxaneyê, qam û giraniya zarokê we dê bê pîvandin (heke ev jixwe di hevdiîna berê de nehatibe kirin). Hemşîreyek dê taya wan, lêdana dil, rêjeya bêhnstendinê qontrol bike û asta oksîjena wan û fişara xwînê bipîve.

Pratîkeke standart e ku ji bo hemû keçên ser 12 salî bi rêya girtina mînaka destava piçûk testa ducanîbûnê bê kirin. Ji kerema xwe ji bo agahiyên zêdetir li malpera Royal College of Paediatrics and Child Health binêre:

[www.rcpch.ac.uk/resources/pre-procedure-pregnancy-checking-under-16s-guidance-clinicians](http://www.rcpch.ac.uk/resources/pre-procedure-pregnancy-checking-under-16s-guidance-clinicians)

Hemşîre dê pîrsa dermanan û alerjiyan bike û dê du bandên nasnameyî li ser zend an jî gozekên zarokê we bixe. Di hin nexweşxaneyan de heke alerjiyên wan hebin, ew dê bandeke zêde an jî bandeke bi rengekî cuda bi wan bixin.

Beriya prosedûrê dê anesteziyê were we bibîne da ku anesteziya zarokê we nîqaş bike.

Lazim e ku anesteziyê di derbarê tendirustiya giştî ya zarokê we de agahdar be, tevî:

- tecrubeyên berê yê anesteziyê
- hemû dermanên ku zarokê we bikar fîne.
- hemû alerjiyên wan
- hemû kuxik, sermagirtin an jî virik û vereşandinên demên dawî

Heke zaroka we an jî endamên din yê malbata we berê di jwariyê de bi anesteziyê re kişandibin, gelek girîng e ku hûn ji anesteziyê re bêjin û hemû agahdariyên li gel we bidin.

Ev demek baş e ji bo qalkirina endîşeyên we û zarokê we di derbarê anesteziyê de. Heke hûn listeyê pîrsên ku dixwazin bikin derxin, dibe ku bo we bibe alîkar.

Girêdayî cureyê emeliyata zarokê we, gava ku zarokê we hê di xew de be dibe ku anesteziyê derziyên anesteziyê yê herêmî lê bixe da paşê êşên wê siviktir bibin.

Herwiha dibe ku lazim be dilop an jî kanûlayên zêde bi kar bînin. Ew ê bi we re sedemên kirina vê û girîngiya ekipmanan nîqaş bikin bo ewlehiya zarokê we di dema xew de û rehetiya wan wexta şiyar bibin.

## Taloqkirina emeliyatê an jî testê

Carna di dema nixandina zaroka we de, dibe ku anesteziyê tiştek di derbarê zarokê we de fêr bibe û ew jî bê wateya ku dê ewlehîr be heke prosedûr ew roj neyê pêkanîn. Heke ev biqewime, ew ê pêşniyar bikin ku kengê domandina prosedûrê dê ewletir be.

## Pêşdermankirin ('pêş-der')

Ew navê dermanan e ku beriya anesteziyê tên dayîn.

Dibe ku anesteziyê dayîna demanên aramker nîqaş bike ji bo alîkar bibe ku zarokê we rehet bibe. Lê belê, ev bi gelemperî nayên dayîn ji ber ku ew dikarin zarokan piştî emeliyatê gêj bikin. Dermanên êşkuj dibe ku wekî pêş-derman werin dayîn, an anesteziyê dibe ku ji bo şertên wekî astimê dermanên din pêşniyar bike.

Piraniya pêş-dermanan wekî dermanên devkî tên dayîn.

## Krema anesteziya herêmî

Dê hema hema hemî zarok 'krema mûcîze' li pişta destên xwe bidin û kinceke paqij li xwe bikin. Ev carna weke 'Ametop', 'EMLA' an naveke din a bazirganî tê binavkirin. Ew kremek anesteziya herêmî ye ku 30-60yan de dixebite.

Ev krem êşa zîz kêr dike dema kanûlayeke bikeve dest an jî milê zarokê we. Ji deh zarokan nehî de êşê gelek baş kêr dike.

Heke krem nikaribe were bikaranîn, spreyeke anestefîk dikare were bikaranîn ji bo tevizandina herêmê.

## Çûna cih

Piraniya nexweşxaneyan cil û bergên rengîn peyda dikin da ku zarokê we li xwe kin dema diçin cihê emeliyatê. Her çend dibe ku zarokê we karibe cilên xwe li xwe ke. Heke lazim be ew dikarin potekî li xwe bikin. Hemşîreyê we dê ji we re bêje ka hûn dikarin kîjan cilên binî lê kin.

Zarokê we dikare bi piyan here odeya anesteziyê, an dikare li ser nivînan, bi kursiyekê an jî trolleyên nexweşxaneyê were birin. Li hin beşan awayên bikêftir ên birinê hene. Li hin nexweşxaneyan dibe ku ew di otomobîlek elektrîkê de werin birin.

## Li odeya anesteziyê

Hemşîre an bijîşkek tenduristiyê, mesela pisporekî listikê ji beşê dê we û zarokê we bibe odeya anesteziyê. Zarokê we dê bikaribe pêlîstokek bigire. Telefonên destan an tablet dikarin bi taybetî kêrhatî bin ku bala zarokê we bi listikan an filman belav bibe.

Heke hûn bixwazin, hûn dikarin bi zarokê xwe re bimînin da ku wî aram bikin dema anestefîk didin wî. Pir kêr dike û merc hene ku ew ne mimkun be. Dema zarokê we di xew de be, dê karmendekî we ji wî cihê derxe ku bihêle fîma anesteziyê li zarokê we binêrin.

Heke hûn bi xwe pir bi endîşe bin, hûn **ne** mecbûr in ku bi zarokê xwe re werin odeya anesteziyê. Endameke din a malbatê an hemşîreyekî beşê an terapîstek listikê dikare bi wî re here.

Dibe ku dema zarokê we li ser trolleyê be anestefîk dest pê bike. Zarokên piçûktir dibe ku di hembêza we de werin anesteziyê. Paşê dê karmend wan bidin ser trolleyê, belkî bi alîkariya we.

Anestezîst dê gazek ji maskeya rû an tûbê bikar bîne, an jî bi kanûlayekê dest bi anesteziyê bike. Ev dê berê bi we re were nîqaşkirin, her çend carna dibe ku plan biguhere ji ber nealîkarbûna zarokî.

Dê piraniya zarokên mezin bi kanûlayekê bîr derzîkin. Heke kanûla were bikaranîn, dê zarokê we bi gelemperî zûbizû bêhiş be û bikeve. Carna derzî dikare mil bicemidîne an biçiqîne. Wê hingê anestezîst dê maskeyek bikar bîne da ku anestefîk berdewam bike û oksîjenek zêde ya ji bo ewlehiyê peyda bike.

Heke anestezi bi gazê were dest pê kirin, anestezişt bi gelemperî maskeyek bikar fîne da ku gazê bide, an ew dikarin bi dest ê hêdîka gazê bi kabekê bidin dev û pozê zarokê we. Bêhna gazên anestezi mîna yên pênuşên bikeçe ne.

Ew bi gelemperî hinekî dem digire (ji çend xulekan heta çend deqeyan) ji bo bandorkirina anesteziyê. Tiştê normal e ku zarok di vê demê de bêhizûrî bikin an dengê nefesgirtina wan cuda be. Dibe ku ew bi dengekî bilind horehor bikin. Karmend dê ji we re be alîkar ku hûn zarokê xwe bi nermî lê rast bigirin.

Wê hingê ji we tê xwestin ku hûn ji odeya anesteziyê derkevin. Endamek karmendan dê we ji wir derxe.

Dema zarokê we hat anestezi kirin, anestezişt dê kanûlayeke bi kar bîne ku aramker û dermanên anestezi yên lazim bidin.

## Paşê çi dibe?

Zarokê we dê were birin bo cihê emeliyatê ku emeliyat bibe an jî prosedûr bê kirin.

Anestezişt dê li seranserê pêvajoyê bi zarokê we re bimîne û dê zexta xwînê, lêdana dil, bêhnstendin û asta oksîjenê ya zarokê we ji nêz ve bişopîne, tesdîq bike ku ewle û bi temamî anestezi kirî ye.

Niha demek baş e ku hûn biçin û tiştê bixwin û vexwin, lê bila karmend bizanibin ku hûn diçin û hejmara tîlefona xwe ya mobîl bidin wan ku bi we re têkilî daynin.

## Pişfî emeliyatê

### Li odeya başbûnê

Piraniya zarokan di odeya başbûnê de şiyar dibin. Anestezişt nêzik e û heke hewce be dikare alîkariyê bike. Ew ê bandajeke deynin dor kanûlayê ku ewle be û neyê dîtin di dema şiyarbûnê de.

Her zarok ji hêla bijîjkek pîspor an pratîsyenek bijare ve tê qontrolkirin ku tesdîq bike zarokê we rehet e. Heke hewce be ew ê dermanên êşkuj û dermanên dijî-nexweşiyê bidin. Di pêvajoya hişyariyê de ji we tê xwestin ku hûn li cihek guncav bi zarokê xwe re bin.

### Diltengiya şiyarbûnê

Hin zarok dema ku şiyar dibin hin nîşaneyên tevlihevbûnê û/an diltengiyê nîşan didin. Ev di zarokên piçûktir de bêhtir dibe.

Pir hindik zarok gelek êş dikşînin. Dibe ku ew bigrîn û dest û lingên xwe bihejin. Dibe ku ev tevger nêzikî 30 deqeyan dewam bike, û carna dirêjtir jî Karmendên odeya başbûnê bitecrube ne ku di demên wisa de li zarokê we binêrin. Ew ê bifikirin ka dê zêdetir êşkuj alîkarî bike an na. Ew ê li we şîretan bikin ka hûn çawa bi rêya baştirîn dikarin zarokê xwe rehet û piştrast bikin.

Ger zarokek di nav êşê de şiyar dibe ev bi xwezayî dê û bavên ditirsîne. Ew ê hêja be ku hûn ji anesteziştê xwe re vebêjin heke zarokê we di demên borî de êşeke wisa kişandiye da ku ew bikaribin li ser pêşîlêgirtina vê nîqaş bikin.



## **Dermankirina êşê**

Dermanên sivikkirina êşê û carinan jî derziyên anezteziyê ên herêmî didin zarokê we ku bi qasî mimkun e zarokê we wexta şiyar be rehet be. Cureyê dermankirina êşê dê bi prosedûrê ve girêdayî be.

Anestezîst, bijîjk û/an xebatkarên beşê dê bi we re li ser cureyê baştirîn a dermankirina zarokê we biaxivin.

## **Çûna malê**

Bi gelemperî mimkun e ku zarokê we roja operasyonê an jî prosedûrê vegere malê ger ku bijîjk û anestezîst dilxweş be ku ev vebijarkek ewle ye û zarokê ber bi başbûnê ve diçe.

Di derbarê awayê dayîna dermanên êşê li malê dê şîret li we bînin kirin. Divê hûn vê şîretê bi baldarî bişopînin.

Hin zarok di rêwîtiya malê de hest dikin an dibe ku nexweş bibin. Kêrhafî ye ku meriv amade bibe!

Ger hûn zarokê xwe bibin malê, dê nimreyek telefonê bidin we ku heke endîşeyek we li ser zarokê we çêbe hûn bikaribin bigerin.

## **Paşê**

Hin zarok ji serdana nexweşxaneyê ditirsin. Hin zarok piştî li nexweşxaneyê bimînin baş ranazên. Dibe ku ew bi we ve bizeliqin û ji berdana we bitirsin. Tevgerê wan dibe ku ji berê dijwartir be. Ev bi gelemperî di nav sê-çar hefteyan de vedigerin rewşa xwe ya asayî.

## **Xeter û bandorên rexeke yê girêdayî anesteziya zarokê we**

Pirsgirêkên cidî ne berbelav in di anesteziya modern de. Piraniya zarokan zûbizû baş dibin û piştî emeliyat û anesteziya vedigerin rewşa xwe ya normal. Dibe ku gelek zarok nebaş hîs bikin û qirika wan biêşe. Ev bi gelemperî bo demek kurt dewam dikin. Dermanên ji bo dermankirina vereşîn û nexweşiyê peyda dibin û gelemperî têne dayîn.

Ji bo zarokekê bi tendirustiyek baş ku emeliyetek piçûk derbas kiribe, pir gelemperî ye ku ev hebin (ji 10 zarokan zêdetir 1ê de):

- êşa serî an êşa qirikê
- nexweşî an gêjbûn
- diltengiya bi şiyarbûnê.

Heke li zehmetiyên kêmtir binêrin, ji 10,000 zarokê de 1, bertekeke cidî ya alerjîk nîşanê anestefîkê dide.

Xetereya mirina ji anesteziyê ji bo zarokên saxlem ên ku dikevin emeliyeten piçûk an ên ne acîl, muhtemelen ji 100,000an 1ê kêmtir e. Piraniya mirinên ku di dema dema emeliyatê de pêk tên sedem ne rasterast ji anestefîkê ye lê ji hêla sedemên din ên girêdayî tendirustiya wî kesî an operasyona wî ye.



Bo xwendina xetereyên gişfî yê girêdayî anestefîkê an jî prosedûreke anesteziyê, ji kerema xwe li ser malpera me li beşa xetereyê binêrin:

[www.rcoa.ac.uk/patientinfo/risks/risk-leaflets](http://www.rcoa.ac.uk/patientinfo/risks/risk-leaflets)

## Diyarkirina xetereyê

Mirov di şîrovekirina gotin û hejmaran de diguherin. Vê pîvanê ji bo alîkariyê peyda bûye.



Di anesteziya nûjen de, pirsgerêkên cidî ne berbelav in.

Ihtimala xetere an jî metirsiyekê zêde ye heke nexweşiyekê cidî ya zarokê we hebe, paşxaneyekê tevlihev a tendirustî, an jî biniya çar salî be û/an jî bikeve emeliyeteke giran.

Zarokên bi nexweşiyên girîng in an pitikên ku emeliyet dibin carna bi taybêfî rastî xetereyên girêdayî anesteziyê tên. Anestezîst beriya emeliyetê dikare vê bi we re bipeyive. Amûr, perwerde û dermanên modern anestefîkê pir ewle kirine, her çend nîkaribin hemî rîskan bi tevahî ji holê rakin jî.

Hin lêkolînên li ser bandorên demdirêj ên anesteziyê li ser pitik û zarokên gelek piçûk hê berdewam in. Heta niha delîlên xurt tune ne ku anestefîk ji bo mezinbûnê zirar e û wexta li ser xetereyên anesteziyê tê nixandî divê ev li gel girîngiya wê ya gişfî ya di prosedûr û emeliyatê de bê fikirîn.

Agahdariya li ser bûyerên krîfîk di anesteziya zarokî de li vir peyda dibe: *Nîşana bûyerên girîng li anesteziya zarokî ya li Keyaniya Yekbûyî: analîzîkirina duyemîn a pratîka anesteziyê li ser zarokan bi çavdêriya darazî (Lêkolîna APRICOT):* [www.onlinelibrary.wiley.com/doi/abs/10.1111/anae.14520](http://www.onlinelibrary.wiley.com/doi/abs/10.1111/anae.14520)

Dibe ku hûn bixwazin ji bo agahdariyên bêtir ji Civata Anestefîstên Zarokî ya Brîtanîyaya Mezin û Îrlandî li jêr binêrin.

[www.apagbi.org.uk/guidelines](http://www.apagbi.org.uk/guidelines) an [www.apagbi.org.uk/children-and-young-people](http://www.apagbi.org.uk/children-and-young-people)

Agahdarî li ser rîskên gelemperî yê girtina anestefîkê ji bo zarokên mezin û ciwanan li ser malpera Kolejê heye: [www.rcoa.ac.uk/patientinfo/risk](http://www.rcoa.ac.uk/patientinfo/risk)

Agahdariya di derbarê dermankirina êşê de dikare di belavoka me de were dîtin *Anestezî ravekirin* ya ku li ser malpera me heye:

[www.rcoa.ac.uk/document/anaesthesia-explained](http://www.rcoa.ac.uk/document/anaesthesia-explained)

Em gelek hewl didin da ku agahiya li vê namilkeyê durist lidar bixin û nûvejen bikin, lê em nikarin li vê ewlehî bikin. Em guman nakin ku ev agahîya gelemper bibe bersivên hemû pirsên we yê gengaz an jî bibe çareserîya her tiştên ji bo we girîng. Bi riya bikaranîna vê namilkeya ku wek pêşber, divê hûn bi fîma bijîjkî ra li ser bijarîyên û metirsîyên xwe bikevin nîqaşê. Divê ev namilkeya xwe bi xwe wek şêwerek neyê bidesthîlgirtin. Ev jî bo armancek bazarî an jî karî nayê bikaranîn. Ji bo redandina berpisriyarîyê, ji kerema xwe ra li vir bitîkînin ([www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji](http://www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji)).

Hemû wergeran jî alî wergervanên jî civaka Translators Without Borders (Wergervanên Bêsînor) tînen çêkirin. Çawanîya van wergeran jî bo duristîya van heta jî dest tê tînen venihartin, lê xetere heye ku hin agahîyan nedurist bin û çewt hatibin wergerandin.

## Ka ji me re bêjin hûn çi difikirin

Pêşniyarên we jî bo pêşketina vê belavokê li ser serê me ne.

Heger hûn dixwazin şîroveyên xwe bêjin, ji kerema xwe wan bi wek peyam ji me re bişînin: [patientinformation@rcoa.ac.uk](mailto:patientinformation@rcoa.ac.uk)

### **Royal College of Anaesthetists (Zanîngeha Mîrane ya ji bo Anestezîstan)**

Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG

020 7092 1500

**[www.rcoa.ac.uk](http://www.rcoa.ac.uk)**

### **Çapa Şeşan, Sibat 2020**

Vê belovêkê di di nav sê salên dîrokê weşanê de bê nîrxandin.

#### **© 2020 Koleja Qralî ya Anestezîstan**

Dibe ku ev belavok jî bo hilberîna materyalên agahdarkirina nexweşan bê kopîkirin. Ji kerema xwe vê çavkaniya orîjînal nîşan bidin. Heke hûn dixwazin beşek jî vê belavokê di weşanek din de bikar bînin, divê agahdarî teqez bînin dayîn û logo, marqe û wêne bînin rakirin. Ji bo agahiyên zêdetir, ji kerema xwe bi me re têkilî daynin.